



Daxwaza mafê penaberiyê:  
agahiyên bingehîn ê hiqûqî ji bo  
daxwaza parastina navnetewî

## KURMANJI



Ev pelik encama pêvajoya şewirmendiya bi Koma Kar a Alîkariya Hiqûqî a li Lesvo ye. Ev agahiyên ku tên dayîn tenê nîşanderî ye û bi giştî kurtasiya qanûnên esil ku têkildarî mafê penaberiyê ku li Yûnan tên bikaranîn e. Her wiha ev ne ê talînin û tên guhertin an jî ji aliyê rayedarên da bi şewazekî din tên bikaranîn û niviskarên vê tu berpîrsiyariyekê hîlnagrin ser xwe. Her kesê ku li Lesvo daxwaza mafê penaberiyê dike pêşniyarî lê tê kirin ku bi parezrekî-awûqatekî re bişewere.

## O/ Saziyên alîkariya hiqûqî:

### GCR (Greek Council for Refugees)

- Agîo Therapontos 5, Mîdîlînî
- Email: gcr-lesvos@gcr.gr
- Duşemiyê heta Îniyê, 10:30 – 12:30

### ELiL (European Lawyers in Lesvos)

- Konteyner ICRC û BRF li Eleona (Morîa)
- Telefon/ WhatsApp: + 30 694 505 1969
- Email: info@elil.eu
- Duşemiyê heta Îniyê, 9:00 – 14.00 li Eleona (Morîa)

### HIAS (Hebrew Immigrant Aid Society)

- P. Kûndûrrotou47, qatê 2an (li ser LoftCafé), Mîdîlînî
- Telefon: 2251055488
- Telefon (Erebî): +306944134335
- Telefon (Farsî & Fransizî): +306944134160
- WhatsApp / Viber
- Duşemiyê heta Îniyê, 09:00 - 17:00

### DRC (Danish Refugee Council)

- “Info Point”, KYT, Morîa: 12:30 – 15:00
- Koma parastinê a DRC amadeye bo wergirtina randevûyê a ji bo parêzer-awûqat
- Li ciyê agahiyên (“InfoPoint”), KYT, Morîa: Duşemiyê heta Îniyê, 12:30 –15:00
- Telefon/WhatsApp:+30 694 840 0494
- Duşemiyê heta Îniyê , 9:00 – 17:00

### Navenda hiqûqê a Lesvo (Legal Centre Lesvos)

- Li Navenda Piştgiriyê a Mosaik tê mêvandarkirin
- Sapfous 9
- Mîdîlînî
- Telefon/WhatsApp +30 6940198997
- Duşemiyê heta Îniyê, 10:00 – 14:00

## 1/ Pênas-tarîfa parastina navnetewî

Li Yûnanîstanê du şewazên parastina navnetewî henin:

1. «Statûya penaberiyê» –li gorî peymanê 1951’an ji bo Statûya Penaberan, penaber «kesekî ku ji ber pêyketina metirsiyên bingehîn,ji ber regez-nîjad, dîn-ol, hemwelatî, tevlêbûna komeke civakî a bi taybet, an jî ji ber baweriyên siyasî, ji welatê xwe dûr ketiye û nikare vegere an jî, ji ber metirsiyên xwe nikare di bin parastina wî welatî da xwe bihewîne, an jî ji ber encaman van bûyeran li welatê ku berê lê dijî bê hemwelatîbû û ji ber van sebebên metirsiyê naxwaze vegere wî welatî».

2. «Parastina duwemdor-duyemîn» - «kesekî mafê parastina duwemdor-duyemîn werbigre, kesekî hemwelatê weletekî sêyem e, an jî bêwelatê ku şert û mercên mafê penaberiyê bi cî naeniye, lê gelek sedemên bingehîn hene ku ev kes vegere welatê xwe, an jî kesê ku di rewşa bêwelatîyê da vegere welatê ku pêşiyê lê dima, wê bi xetera-gefên rasteqîn re rûbirû bimîne û wê xisareke mezin lê were kirin ji ber van sedeman ev kes nikare xwe di bin parastina vî welatî de xwe bihewîne».

Şewazeke parastinê a din heye ew jî , dema ku parastina navnetewî hun wernagirin muhtemelen ev were bikaranîn, ev jî «statûya însanî-mirovahî» e, ev cûreyekî destûra rûnstandinêye bo saleke ye û bo sedemên îstîstanî însanî-mirovahî ji aliyê Wezareta Navxweyî ve dema di asta îstinafêda daxwaznameya we tê redkirin û Lijneya Îstinafê doz-dosya we bo vê cûreya parastinê hewale dike, tê dayîn.

Mafê we heye hûn her kêliyê daxwaza parastina navnetewî bikin. Dema hûn nuh gihîştin Lesvo, hûn dikarin daxwazna parastina navnetewî bikin. Heta ku daxwaza parastina navnetewî bikin hûn dikarin vegeerî Tirkîyê.

## 2/ Dema we daxwaza parastina navnetewî kir ev maf û mecbûriyetê we ê li jêr henin:

### Maf:

- Mafê heta daxwaznameya mafê penaberiyê bidawî dibe, bişûnda venegerandina Tirkîyê.
- Mafê we heye hûn agahdariyê ji bo daxwaznameya mafê penaberiyê, maf û mecbûriyeta bi zimanê ku têdigêhejin werbigrin.
- Mafê we heye hûn xwe bigihêjin alîkariya bingehîn a ji bo xanî, xwarin, hûqûqî, tîbbî û civakî-derûnî.
- Mafê bo kar-şixul
- Mafê ji bo sîgorteya civakî
- Mafê perwerdahiyê (zarokên we dikarin biçin dibistanê)

### Mecbûriyetî:

- Mecbûriyeta we heye hûn bi rayedarên Yûnanî re hevkarîyê bikin.
- Mecbûriyeta we heye hûn qanûnên yûnan bi cîhbikin
- Mecbûriyeta we heye heta ku daxwaznameya we

- a bo mafê penaberiyê bi dawî dibe ji yûnan neçin.
- Eger hûn di bin sînordariya cografîkda nin, mecbûriyeta we heye hûn ji Lesvo neçin.
- Mecbûriyeta we heye hûn qert-pelika daxwazkeriya penahê(İltica-luco) nuh bikin û di tarîxa ku hatiye diyarkirin da tevî hevpeyvîna mafê penaberiyê bibin.
- Mecbûriyeta we heye hûn her carê agahiyên xwe li daîra penaberiyê nuhbikin-ev pêwîste, ji ber ku daîra penaberiyê dikarin bi were bikevin têkiliyê, wek mînakê bo ku tarîxa hevpeyvîna we nuhbikin an jî agahiyên zêdetir ji bo daxwaza mafê penaberiyê ji we bixwazin.

Bila di bîra we da be eger hûn van mecbûriyeta binpêbikin, xetera ku hûn werin biçavkirin an jî nixandina daxwaza we a mafê penaberiyê were qutkirin heye.

## 3/ Qeydkirin-tomarkirina polês:

### Polês:

- Hûnê biryarekê ji polês werbigrin û ev biryar emir dide we ku hûn li Lesvo bimînin heta pêvajoya qonaxa din bidawî dibe.
- Hûnê pelgê ji polês werbigrin- pelga ku hûn werbigrin yek an jî du peliye A4e , agahiyên şexsî û li jor li hêla rastê jî wêne-sûret heye. Di vê pelgêda hêmarek heye û ev hêmar di hemî pêvajoya penah-İlticayêda we dişopîne.
- Polês wê şopên tiliyên werbigre (ji bo kesên temenê di ser 14 salî re ye) (sîstema-pergala EURO-DAC).

Di bîra we da be, agahiyên xwe ê rast bidin (nav temen û hwd.) – piştê hûn nikarin van agahiyên biguherînin, tenê eger pelgên we ê resen-eslî wek nasname an jî pasaport hebe hûn agahiyên xwe dikarin bidin guhertin. Eger hûn piştê bixwazin agahiyên xwe biguherînin, pêwîste hûn biçin Daîra Penaberiyê a Yûnanî û li wir daxwazbikin.

## 4/ Pêşwaziya ewil û dîtina doktor:

Pêşiyê hûnê di bin qontrola tîbbî re derbas bibin.

Wê qerta tîbbî ji were derxînin- pelgek A4 wêne sûret li jor li hêla rastê heye, heman danayên tîbbî bi yûnanî û Îngilizî ne.

**Karmendên tîbbî wê nesaxî û hesasiyên laşî wê binasin- bila di bîra we da be hûn karmendên tîbbî agahdar bikin ji bo:**

- Eger hebe, nexweşî û hesasî ku di laş da nayê dîtin
- Eger hûn rastî tundiya zayendîtî hatine (bi taybetî 72 saatên dawîn) an jî eger hûn qurbanîyên îşkenceyê nin.

Eger karmendên tenduristiyê bihesebine ku di laşê we da nexweşî û hesasî ku xwiya dikin tune ne, wê piştê randevûkê bidin we bo ku hûn ji bo rewşa hesasî werin nixandin.

## 5/ Hesasî:

**Di qanûnên yûnanî da ji bo «rewşa hesasî» kategoriyên hatine diyarkirin henin. Ev li jêr in:**

- Zarokên bêkes.
- Kesên kêmendami-seqet an jî kesên ku nexweşiyekî wî a giran heye an jî nexweşiyeke nayê terapî kirin,
- Kesên temen mezin (bi ser 65 salî re ).
- Jinên ducanî an jî hîn nu zarok anîne dinê.
- Dê û bavên bi tenê bi zarokên temen biçûk re.
- Qurbanîyên îşkencê, destdirêjîyê an jî tûndiya zayendî, a laşî an jî şêwazên derûnî an jî bikaranîn, kesên ku bi rewşa stresa metatravmatîk, û dîsa kesên ku ji binavbûna keştiyê filitîne an jî xizmê-malbatên qurbanîyên binavbûnê ne.
- Qurbanîyên bazirganiya-tucariya mirovan.

**Ji bo rewşa hesas hûnê werin lêkolînkirin:**

- Tehlîla tibbî – ji aliyê rayedarên yûnan da tê programkirin
- Îhtimala nirxa derûnî – Eger hûn dixwazin derûnas bibînin, di dema tehlîla tibbî da doktor-bijîjk agahdarbikin. Ji bo nixandina derûniyê wê piştre ji aliyê rayedarên yûnan ve were programkirin.

**Eger hûn werin naskirin wek «kesekî bi hesasî» piştî nixandina rewşa hesasî, hûnê pêvajoya «normal» bişopînin. Ev tê vê wate yê:**

- Wê bisînorîya cografîk ji ser we rabe, ew tê wê wateyê ku hûn dikarin ji Lesvo biçin.
- Nixandina daxwaza we a mafê penaberiyê wê bitemamî bi bingeha li gorî sedemên ku hûn ji welatê xwe derketine û ne mimkûne hûn vegezin vî welatî were kirin - hewce nake hûn îsbat bikin ku li Tirkîyê hûn ne di ewlahiyêda bûn an jî li wir we nikarîbû xwe bigihêjanda parastina navnetewî.

Bila di bîra we da be ku ev agahiyên ku di dema nixandina rewşa hesas û di hevpeyvîna bo mafê penaberiyê da hûn derdixin holê veşartî dimînin.

Bila di bîra we da be ku, pêwîste her îhtimala bo rewşa hesasî zûtir û heta ji dest we tê bi temamî aşkere bikin. Di dema nixandina rewşa hesasî da eger we hesasiyeta xwe eşkere nekiribe jî, hûn dikarin piştre aşkere bikin , bi taybetî jî di dema hevpeyvîna bo mafê penaberiyê hûn dikarin aşkere bikin.

Bila di bîra we da be ku rewşa hesasiyê û dayîna parastina navnetewî ne wek hev e. Ji ber ku tenê wek kesekî rewşa we a hesasî hatiye naskirin nayê wê wateyê ku wê parastina navnetewî otomatîk bidine we û gelekî muhîme hûn xwe ji bo hevpeyvîne amade bikin û tevî hevpeyvîne bibin.

## 6/ Qeyd-Tomarkirina daxwaza penah-îlticayê:

Di vê nuqte da, pêwîste hûn werin Daîra penaberiyê bo ku hûn daxwaznameya penah-îlticatê bikin-hûnê hejmara doz-dosyaya xwe, qert-pelikê daxwazkerê penah-îlticayê û roj dema hevpeyvîne werbigrin. Wê şopên tiliyên we ji aliyê Daîra Penaberîya a Yûnanî an jî ji polêsên Yûnan werin girtin.

Wê ji we were xwastin bi kurtasî sedemên ku we welatê ku terk kiriye bibêjin.

**Ji nuh ve hevgirtina malbatê:**

- Bila di bîra we da be eger endamên malbata we li welatên Ewropayê din hebin, ku hûn dixwazin bi wan re bibin yek bibêjin- mînak:hevjina/hevjîne we, zarokên we ê di bin hijde salî re an jî endamekî malbata we ku hûn pêve girêdayîne. Gelekî muhîme hûn di dema qeyd-tomarkirina daxwaza penabariyê bînin ziman an jî piştî tomarkirinê, ji bo ku hûn bi derengî nemînin.
- Pelgên-dokumanên mayîna endamê malbata we li welatekî Ewropayê îspat dike ( mînak: destûra rûniştinê, îspata navnîşana wî) û hemî belgên ku têkiliya we a malbatî îspat dikin.
- Ji bîr nekin belga nivîskîya razîbûnê a daxwaza hevgirtinê a endamê malbata xwe re îmze bikin-tenê daxwaza hevgirtinê a bi endamê malbata xwe re di dema qeyd-tomarkirina daxwaza mafê penaberiyê da anîna ziman ne bese.
- Daxwaznameya bo hevgirtina malbatê (yanê îmzekirina razîbûna nivîskî)ji dema ku hûn hatine tomarkirin bo daxwaza penaberiyê pêwîste di navbera sê mehan-heyva da bibe,eger endamê malbata we li Almaniya yê dimîne, wê demê daxwaznameya bo hevgirtina malbatê pêwîste di dema ku hûn gihîştin Lesvo û pêda di navbera sê mehan-heyva da çêbibe.

Ji bîr nekin sûretên pelgên bi nav û agahiyên şexsî hwd. bînin bo ku agahiyên we ê rastî werin tomarkirin.

Hemî pelgên we ê şexsî wê li we şûnda vegezin. Lê rayedar wê pasaporta we li gel xwe bigrin.

Ji bîr nekin agahiyên xwe ê şexsî ê rasteqîn bidin (nav, temen hwd.) piştre eger nasname an jî pasaporta we tunebe hûn nikarin van agahiyan bidin guhertin.

Ji bîr nekin dema ku qeyd-tomarkirina we bidawî bû, û di dema piştrastkirinê da hate xwendin, baş guhdar bikin (yanê pêşîya ku hûn agahiyan pişterast bikin û formê îmze bikin) eger şaşî hebin personelên ku we qeyd-tomarkirin agahdar bikin.

## 7/ Hevpeyvîna penah-îlticayê:

**Ji bo hevpeyvîne:**

- Tarîxa hevpeyvîna we li ser qert-pelikê daxwaznameya mafê penaberiyê hatiye nivisandin.
- Hevpeyvîn li Morîa pêknayê-li Paganî pêk tê, û hûnê ji Morîa bi otobûsê werin veguhestin.
- Di bîra we da be, hemî belgên tibbî û hemî pirsgirêkên ê tibbî bibêjin ( him ji bo wê rojê xwe çî hîsdikin him jî bi demdirêjahî )wê derfetê we hebin ji bo rewşa xwe a hesasî aşkere bikî û pêwsite bitemamî rewşa xwe îzahbikî.
- Di bîra we da be, eger rewşa we a hesasî nehatiye nixandin berpîrsiyarê hevpeyvîne jê agahdar bikin.
- Di bîra we da be, berpîrsiyarê dozê ji bo nixandina rewşa derûniya xwe agahdarbikin û eger hûn li benda randevûyekê'nin û ev belga we heye pelgê randevûya xwe nîşan bikin.
- Di bîra we da be, ev derfeta we a bitenê ye bo ku hûn çîroka xwe bêjin-piştirastbikin ku hûn her agahiyê aşkera dikin û her îspata ku têkiliya wê bi daxwaznameya we re heye hûn pêşkêş dikin û a baştir pelgên resen-eslî pêşkêşbikin. (Mînak: wêne tiştên ku we di Facebook'ê weşandinin, gotarên di rojnamêda, nasnameya pîşeyî-meslekî (mîna: eger hatina we bi pîşeya-meslek a ku we dikir ve girêdayiye) gef-tehdît) Piştî hevpeyvîne jî hûn dikarin belgên-îspatên xwe bidin. Dayîna dema belge-îspatan piştî hevpeyvîne 5 rojin, dibe ku piştî vê demê jî dayîna wan were qebûlkirin.

**Wê pirs ji we werin kirin bo:**

- Agahiyên şexsî
- Pirsgirêkên tenduristî/rewşa hesasî
- Li gorî hemwelatiya we û statûya rewşa we a hesasî dibe ku pirsên wek, eger Tirkîye ji bo we welatekî ewleye an na, û eger we dikarîbû li wir daxwaza parastina navnetewî bikira:
- Sedemên ku hûn ji welatê xwe hatin û çima hûn nikarin vegezin welatê xwe-mînak: Çima pêwîstbû hûn ji welatê xwe biçin, û wê çî biqewime ku hun bizivirin-vegerin? Li welatê we heremek din a ewle heye ji bo we?

**Ev mafên we henin:**

- Mafê we heye hûn parezerekî bi xwe re bibin hevpeyvîne.
- Mafê we heye hûn ji bo hevpeyvîne xwe amade bikin-eger rewşa we wek rewşa hesasî nehatiye qebûlkirin mafê we û rojek bitemamî heye, û herî kêmtir heft roj jî bo kesên rewşa wa wek hasasî hatiye qebûlkirin. Ev gelekî muhîme bo hevpeyvîna we ku zutir çêbibe an jî wê di demeke qut da wê pêk bê.
- Mafê we heye hûn wergêrekî din bixwazin dema ku hûn dibînin wergera ku dike ne başe.
- Mafê we heye hûn zayenda(mêr an jin) wergêr û kesê ku hevpeyvîne çêdike hilbijêrin.
- Mafê we heye hûn bixwazin hevpeyvîn bi zimanî zikmakî-dayîka we çêbibe.
- Mafê we û tecilê-bişûndaxistinê heye (eger we careke din tecil nexwastiye ev otomotûk wê were dayîn. Eger we careke din tecil xwastiye, hûn dikarin carek din tecilê bixwazin lê pêwîste sedemên we ê muhîm hebin (mînak: wek nexweşiyên ciddî ku hûn nexweşin û nikarin tevî hevpeyvîne bibin-dî vê rewşê da îspat ( mînak rapora doktor) gelek bi kêr tîn))
- Mafê we û navber-îstirhet xwastinê heye.
- Mafê we heye hûn kopya-suretekî ji qeyd-tomarkirina deng û zabita hevpeyvîne werbigrin.

**Ev mecbûriyetiyê we henin:**

- Macbûretiya we heye hûn tevî hevpeyvîne bibin – eger we hevpeyvîna xwe wenda kiribe, doza we wê were girtin û sebebên asil hûn pêşkêş nekin ji bo ku hûn tevî hevpeyvîne nebûne, mimkûne gelekî zehmet be careke din, ji nuhve doza-dosya we were vekirin.

## 8/ Îstinaf:

**Agahî :**

- Eger daxwaznameya we piştî hevpeyvîna penah-îlticayê hate redkirin mafê we û îstinafê heye.
- Eger hûn wek kesekî bi rewşa hesasî hatine nixandin, piştî biryar-qerarê di navbera 30 rojî da pêwîste hûn serlêdana îstinafê bikin. Eger hûn wek kesekî bi rewşa hesasî nehatiye nixandin, pêwîste di navbera 5 rojan da hûn serî li îstinafê bidin.
- Istinaf pêvajoyek nivîskî ye. Têbinî a îstinafê wê were dayîn û ji aliyê Lijneya Îstinafê a Atîna da wê were nixandin.Eger Lijne bang we neke, hevpeyvîneke din tune ye û ne hewce ye hûn tevî bibin.

**Maf :**

- Mafê we heye hûn piştgiriya hûqûqî ji dewletê bixwazin û parezerekî Yûnan wê bêpere têbinîya(not) ji bo îstinafê binivîsîne. Ev têbinî(not) pêwîste naveroka wê bi hincetê çima lazime hûn parastina navnetewî werbigrin were nivisandin, û herî dawî 2 roj pêşîya ku îstinafa we were nixandin were dayîn. Dema ku hûn îstinafê dikin pêwîste hûn ji karmendê Daîra Penaberîya Yûnan parezer bixwazin.
- Mafê we heye hûn nixandina îstinafa xwe tecil-bişûnda bixin,eger perêzer ji were nayê dabînkirin ( Lê ji bo tecilkirinê Lijneya Îstinafê ne mecbûre- neçare ku daxwaza we bipejirîne-qebûl bike û mimkûne îstinafa we bê parezêr jî were nixandin)

**Di bîra we da be:**

- Belgên we ê tibbî pêwsite hûn bidin Daîra Penaberiyê an jî parêzerê xwe, bi taybetî jî ev pelgên ku piştî biryara hevpeyvîne we wergirtine.
- Hemî belgên xwe ê têkiliya wan bi daxwaznameya we re henin, pêşîya roja nixandina îstinafê pêwsiste hûn bidin parêzerê xwe.

## 9/ Eger îstinafa we were redkirin:

Eger îstinafa we were redkirin li gorî hûn hatine naskirin wek kesekî rewşa statûya wî hesase an na, mimkûne hûn werin binçavkirin û bi şûnda werin şandin Tirkîyê an jî werin dersînorkirinî welatê ku hûn jê hatine.

**Aalternatîfên hûqûqî- ji bo nixandina doza xwe bi parêzerên xwe re bikevin têkiliyê:**

- Pêvajoya dadî-mahkemeyî – ji dema ku îstinafa we hate redkirin di nava 60 rojî da, mafê we heye hûn daxwaznameya îptalkirina biryara îstinafê li dadgeha-mahkemeya yûnanî a îdarî bikin, an bi rêya piştgiriya hûqûqî a sazîyên sivil( derfetên wan kêmtir in, ji ber baca îdarî ku ji wan tê xwastin) an jî bi rêya parêzerê serbixwe. Rêya duyemîn ji ber ku buhayê wê heye-pêwsite hûn bi parêzer re bikevin têkiliyê werin agahdarkirin.
- Daxwaznameya mafê penaberiyê a piştre- 60 roj piştî ku we biryara redkirinê a îstinafa xwe wergirt, mafê we heye hûn careke din daxwaznameya mafê penaberiyê bikin. (mînak: wek agahiyên nuh li welatê we ji bo herêma we an jî welatê ku berê hûn lê bûn, ji bo doza we hencetên nuh, pelgên tibbî ê nuh( mînak: wek belga ku nîşandike ku hûn qurbanîyê eşkencê nin)